# Derbarê me de

Cîhana mirovahiyê di watayekê de cîhana nasnameyan e, yên ku nasnameya wan tunebe, ti devs û şopeke wan jî tuneye. Li ser bingeha vê rastî û pêdiviyê, “Kurdşop” dixwaze Ziman, Wêje, Erdnîgariya Nîştiman, Dîroka hevpar, Kultûr û Kelepûr, Huner û ... htd û hemû pêkhînerên nasnameya Neteweya me ji riya pencereyekê ve wergire û kom bike, da ku şop û nasnameya Kurd jî wek neteweyên din xuya û berçavtir be.

Di nebûna statûyeke kurdî de, bi sedema siyaseta bişavtina sîstematîk ji hêla neyarên Kurdan ve, girîngiyeke wiha bi wan biyavên nasnameya me nehatiye dan, û gelek bi kêmî avirek bi wan hatiye dayîn. Lewra heya niha jî me zimanekî yekgirtî tuneye, dîroka wêjeya me bi tewahî nehatiye komkirin, erdnîgarî û welatê perçe perçekirî yê me ji bo para herî zêde a xelkê vî nîştimanî bîhanî ye. Beşeke zêde ji dîroka me bi pênûsa dijmin û neyaran hatiye nivîsîn û berevajî hatiye nîşandan. Kultûr û kelepûra me a dewlemend di bin zexta herî giran a talankirin, bişavtin û asîmîlasiyona neteweyî de hêdî hêdî kêmreng dibe. Şûnwarên me ên dîrokî têne dizîn û talankirin, hunera me jî zêde girîngî pê nayê dan.

Di rewşeke wiha de Saziya “Kurdşop”ê wek erkeke netewî ji bo parastina wê heyî û samana dîrokî, kelepûrî û civakî ku li Kurdistanê heye, û bi armanca pênasandina wê samanê bi kurdên her perçeyeke Kurdistanê û yên derwey Welat, herwisa pênasandna wan hemû biyavên  ku li Kurdistanê hene bi xelkê biyanî, biryar da ku malpera “Kurdşop”ê veke, û di pêgava yekem de bi zaravayên kurdî a “Kurmancî û Soranî” û herwiha bi zimanê îngilîzî, vê malperê bike sekoyek ji bo vegeşîn û rengvedana nirxên civakî li Kurdistanê.

Di serdema niha de cîhana dîcîtalê ew derfet ji bo neteweyên bê dewlet jî pêk aniye ku bikarin bi hêsanî temsîla nasnameya xwe bikin. “Kurdşop” jî di vî warî de dozhilgirê şopa Kurd di vê cîhana berfireh de ye.

Saziya “Kurdşop”ê wek saziyeke nehikûmî ku li Hewlêr a paytexta Herêma Kurdistanê hatiye tomarkirin, bi hewl û alîkariya komeke ji xebatkarên xwebexş ji her aliyek Kurdistanê, bo xizmetkirin bi Ziman, Dîrok, Kultûr û Kelepûra Kurd û gehandina nûçe û zanyariyên bawerpêkirî, karên xwe dest pê kiriye û hêvîdar e ku bi piştevaniya nivîskar, lêkoler, hunermend, derhîner û çalakên Kurd li hemû parçeyên Kurdistanê, bikare samana me`inewî a Kurd di malpera “Kurdşop”ê de kom bike û biparêze û veguhêze bo xelkê cîhanê û nifşên paşrojê.

Malpera “Kurdşop”ê hewl dide ku bibe arşîv û çavkaniyeke bawerpêkirî bo hemû cure zanyariyên li ser Dîrok, Ziman, Erdnîgarî, Urf Edet, Kultûr, Kelepûr, Huner, Şûnwar û ... hwd û her biyaveke din ku têkildarî jiyana xelkê Kurdistanê be.

Di vê riyê de çavê me li hevkariya hemû dilsojên Kurd û wan kesan e ku xema Kurdbûnê me li cem hevdu kom dike.

Saziya “KURDŞOP”ê bo xizmetê bi ziman, dîrok, çand û hunera Kurdî

2021

BERNAME Û PEYREWA NAVXWE YA “KURDŞOP”Ê

**Beşa yekem**

**Nav, logo û pênaseya saziyê**

**Madeya /1/**

**Yekem -** Navê saziyê bi Kurdî, Erebî û Îngilîzî:

Saziya “kurdşop”ê bo xizmet bi dîrok, çand/kultur û hunera Kurdî

منظمة "كوردشۆپ" لخدمة اللغة، التاري خ، الثقافة والفنون الكوردية

KURDSHOP Organization for promoting Kurdish language, history, culture and art

**Duyem-** Kurtkiriya navê saziyê “Kurdşop” e û arm û logoya tewaw û kurtkirî bo medyayê:

**Sêyem -** Hêma û logoya saziya “Kurdşop”ê bi tîpên Kurdî yên Latînî “Kurdşop” ku bi rengê spî li ser bagrawendeke sor hatiye neqişandin, tê naskirin. Diruşma saziyê ev e:

**“ÇANDA ME NASNAMEYA ME YE”**

**Çarem -** Pênaseya saziyê:

Saziya “Kurdşop”ê di warê hiqûqî û rasteqîneyî de saziyeke sivîl a nehikûmî ya qazancnexwaz a serbixwe ye ku, li ser bingeha yasaya pejirandî û rêpêdayî ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê bo saziyên sivîl (medenî) hatiye avakirin. Saziya “Kurdşop”ê bi dûr ji her awayekî ji cudahîdanîna zayendî, civakî, olî, hizrî û erdnîgarî, dixwaze li ser bingeha kultura demokrasî û aştiya civakî, di pêxema vegeşandina ziman, çand, dîrok, huner û kelepûra Kurdî û nasandina şûnwarên kevnar ên Kurdistanê, hêz û şiyanên xwe bixe xizmeta hevwelatiyên Kurdistanê.

**Madeya /2/**

**Sînorê karkirinê û navnîşan:**

Binkeya sereke ya Saziya “Kurdşop”ê li “Hewlêr”a paytexta Herêma Kurdistanê dibe. Ger pêwîstî pê hebe, sazî dikare li gorî rêsayên yasayî, li bajarên din ên Kurdistanê û li derveyî welêt jî, şaxên xwe veke.
Email: Info@kurdshop.net

Tel: (+964-751-460-9262) - (+964-751-430-3262)

**Beşa Duyem**

**Armac û awayê karkirin û bidestxistina armancan**

**Madeya /3/**

**Armanc û awayê karkirinê**

**Yekem- Armancên saziyê:**

Bi pêbendbûna bi yasayên berkar ên Herêma Kurdistanê û parastina berjewendiyên gelemperî û bilind ên Herêma Kurdistanê, ku kok û bingeha sereke û berpirsayetiya Saziya "Kurdşop"ê ye, ew armancên ku li jêr qala wan hatiye kirin cewherê sereke yê karên me ne, û em dixwazin bi awayekî medenî û aştîxwazane bo bidestxistina wan tekoşînê bikin.

- Hewldan bo hişyarkirin û bizivandina hestê çîn, tex û qatên civaka Kurdistanê, di pêxema xwedîderketina wan de li nasname û bihayên neteweyî û nîştimanî.
- Vegeşandina kultura tolerans û tebahiyê, bo rêzgirtina ji cudahiyan û pêkvejiyana aştiyane di navbera hemû grûp û pêkhateyên olî, civakî, zaravayî, zayendî û hizrî de, bi dûr ji tundûtîjiya di nav civaka Kurdistanê de.
- Bidekumentkirin û vegeşandina heyiya neteweyî di biyavên: Dîrok, ziman, çand, huner, muzîk, folklor û şûnwarên dîrokî de.
- Berhemanîna dekumentar, drama, fîlm, klîp, kartonên zarokan, waneyên xwendina Kurdî û programên taybet bi Zimanê Kurdî û weşandina wan di torên civakî de, bi armanca hişyarkirin û bilindkirina hestê neteweyî û nasandina erdnîgarî û şikoya nîştimana me, li navxwe û cîhanê.

**Duyem – Awayê karkirinê**:

Bi her şêwazekî karê sivîl û aştîxwazane, ew rêkarên ku li jêr hatine, em ê ji bo karên xwe bi bingeh bigirin:

- Hewldan bo pêkanîna semînar û korsên perwerdehiya ziman, çand, huner û dîrokê.

- Hevpeyvîna ligel zimanvan, hunermend û şarezayên dîrokê û tomarkirin û weşandina fîlmên wan, li ser torên medyaya civakî, bi mebesta ku her kesek bikaribe di her demekê de, sûdê jê werbigire.

- Tomarkirin û berhemanîna fîlm, kurtefîlm û girteyên vîdyoyî ji hunermendên (sînemakar, stranbêj, muzîkjen, grûpên dîlanê) û weşandina wan di torên civakî de.

**Beşa Sêyem - Prensîpên karkirinê:**

**Madeya /4/**

**Bingehên karkirina bo saziyê:**

- Pêbendbûn bi yasayên navdewletî yên taybet bi mafên mirov.
- Peyrewkirina yasayên berkar ên Herêma Kurdistanê û parastina berjewendiyên giştî û bilind ên Herêma Kurdistanê.
- Pêbendbûna bi kultura demokrasiyê û canê hevqebûlkirina pêkhateyên cuda yên Kurdistanê û parastina aştiya civakî.
- Pêbendbûna bi rêbazên xebata sivîl.

**Not**:

Ew şaxên saziyê ku li derveyî Herêma Kurdistanê ne, pêbendî yasayên peyrewkirî yên wan cihan dibin ku li wir kar dikin.

**Beşa Çarem**

**Endametiya di saziyê de**

**Madeya /5/**

**Endametî**

- Ji temenê yasayî yê (18) saliyê ve, bi dûr ji sînordarkirina: Zayend, ol, netewe, erdnîgarî, her takekî/e xwedîşiyan ku bixwaze dilxwazane û bi bê beramber, di çarçoveya peyrewa navxwe ya Saziya “Kurdşop”ê de kar ji bo armancên saziyê bike, dikare bibe endam û çalakê Saziya “Kurdşop”ê.
- Cuda ji takekesan, kom û grûpên hunerî û enstîtuyên kulturî dikarin bibin endamên Saziya “Kurdşop”ê.

**Not**: Wergirtin yan derkirina endam di deshilata (Desteya Birêveberiya Kurdşopê) de ye.

**Madeya /6/**

**Mercên endametiyê:**

Temenê yasayî yê (18) saliyê biserî kiribe.

- Bi nivîseke fermî daxwaza endametiyê di saziyê de bike.
- Armancên Saziya "Kurdşop"ê qebûl bike û bo bidestxistina wan armancan xebatê bike.
- Li hemberî karê xwe daxwaza wergirtina heqdest neke.
- Pêbendî prensîpên giştî yên saziyê be.
- Aboneya endametiyê bide.

**Beşa Pêncem**

**Erk û mafên endam**

**Madeya /7/**

**Erkên endam:**

- Bi bê ti ferq û cudahîdanînekê, rêz û hurmetê ji tevahiya bihayên kulturî, olî, zaravayî, civakî û zayendî yên pêkhateyên civaka Kurdistanê bigire û bo bidestxistina armancên Saziya "Kurdşop"ê çalakiyan bike.
- Birêvebirina erkên saziyê li gorî şarezahiya di biyavê diyarkirî de.
- Hewldan bo berfirehkirina tora têkiliyên civakî û vedîtina çavkaniyên alîkar bo "Kurdşop"ê.
- Destpakî di parastina madî û teknolojî de, û emanetdarî di parastina nihênî û sirrên saziyê de.
- Pêbendbûna bi dana aboneya mehane.

**Madeya /8/**

**Mafên endam:**

- Dibe xwediyê nasnameya taybet bi saziyê.
- Mafê beşdariya di civînên saziyê de, û eşkerekirina ramana xwe û lêpirsîn û wergirtina bersivê heye.
- Li gorî peyrewa navxwe, mafê endam ê dengdanê di civînên saziyê de heye.

- Mafê endam ê gilîkirina li berpirsan û biryarên saziyê heye.
- Mafê wî yê agahdarbûna li çalakiyên saziyê heye.
- Mafê wî yê wergirtina berpirsayetiyê di saziyê de heye.
- Mafê wî yê wergirtina bawernameyên rêzgirtinê û xelata moralî heye.
- Mafê destberdana ji kar û saziyê heye ku divê bi awayê nivîskî be.

**Beşa Şeşem**

**Serpêçî û siza**

**Madeya /9/**

**Serpêçiyên sizahilgir:**

- Bikaranîna alav û hitbara saziyê bo berjewendiya takekesî.
- Dirustkirina astengiyan, û pêkanîna kêşeyên rêveberî di nav stafa saziyê de.
- Amadenebûna bimebest û bêbehane di civînên saziyê de, ku gelek caran dûbare bibe.
- Pêbendnebûna bi yasayên berkar ên Hikûmeta Herêma Kurdistanê û biryarên (Rêveberiya Îdareya Nehikûmî).
- Pêbendnebûna bi yasayên wan welatên derekî ku şaxên saziyê li wan kar dikin.
- Xisarkirin yan jî windakirina heyiya saziyê, yan jî sûdwergirtina xirab ji bawerî û karînên saziyê, yan jî her awayekî ji serpêçiyeke selimandî. Ew endam li gor yasaya wî welatî ku binpêkarî tê de rû daye, tê sizadan.

**Madeya /10/**

**Sizayên diyarkirî ji endam re:**

- Sexerbirina devkî û hişyarkirin.
- Sexerbirina bi nivîskî.
- Sirrkirin.
- Jêstandina mafê endametiyê.

**Di van rewşên jêr de endametiya endaman di saziyê de bi zorê tê hilweşandin:**

- Eger endam karekî kirêt û dijî yasayên saziyê bike, ku ziyaneke mezin bigihîne navbangê saziyê.

- Eger endam têkiliya wî/ê bi grûpên terorîstî û ji yasayê derketî yên dijî mafên mirov re hebe.

**Not**:

- Dema pêbendnebûna endam bi peyrew û prensîpên saziyê, yan nedana aboneya mehane, xisarkirina heyî û samanê saziyê, sûdwergirtina xirab ji hitbara saziyê û her cure binpêkariyeke neyasayî, bi dengên (nêvî zêde yek) ên Desteya Birêveberî, mafê endametiyê jê tê standin.

**Beşa Heftem**

**Pêkhateya saziyê û awayê karkirinê**

**Madeya /11/**

Peykerê saziyê ji van yekeyên jêrîn pêk tê:

**Yekem**- Desteya Avaker: Ji (5) kesan zêdetir pêk tê, ku avakerên saziyê ne.

**Duyem-** Desteya Giştî: Ji tevahiya endamên saziyê pêk tê.

**Sêyem-** Desteya Birêveber: Ji serok û cîgirê serok û birêveberan pêk tê.

**Madeya /12/**

**Deshilatên Desteya Avaker:**

Desteya Avaker ji (5) kesan yan bêhtir pêk tê, ku tê de di avakirina saziyê de berpirs in.

1. Hilweşandina saziyê bi dengê (50+1) ji Desteya Avaker.

2. Pêşkêşkirina pêşniyaran bo Desteya Birêveber.

3. Nirxandin û şopandina çalakiyên saziyê.

**Madeya /13/**

**Deshilatên Desteya Giştî:**

Desteya giştî ji tevahiya wan endaman pêk tê, ku mafê wan ê endametiyê heye û dikarin dengê xwe bidin û xwe berbijêr bikin.

Desteya Giştî di civîneke berfireh de, bi hilbijartineke azad û nepenî dikare serok, cîgirê serok, berpirsên beşan û (2) endamên yedek hilbijêre.

**Madeya /14/**

**Desteya Birêveber û deshilatên wê:**

**Yekem - Pêkhateya Desteya Birêveber:**

1. Serokê saziyê.

2. Cîgirê serokê saziyê.

3. Birêveberê rêveberiyan.

**Duyem - Deshilatên Desteya Birêveber:**

1. Desteya Birêveber di navbera du hibijartinan de, li hemberî karûbarên birêveberî û darayiya saziyê, berpirs e.

2. Bi rêjeya piraniya endaman (50+1) dikare ligel saziyeke din hevgirtinê bike yan jî torekê pêk bîne.

3. Amadekirin, darijtin, pejirandin, bilindkirina projeyan û biryardana li ser nûneran bo îmzekirina girêbestan.

4. Li ser pêşniyara piraniya Desteya Birêveber çêdibe ku şaxên nû li bajar û bajarokan yan jî li derveyî Herêma Kurdistanê bêne vekirin.

5. Bi biryara (50+1) ji Desteya Birêveber sazî tê hilweşandin yan jî logoya wê tê guherîn.

6. Bi biryara (50+1) ji Desteya Birêveber peyrewa hundirîn a saziyê tê guherîn yan jî sererastkirin.

**Madeya /15/**

**Deshilatên serok:**

- Rêkarên birêveberiyê derdike û îmzeyê li ser nivîsan dike û mafê wî yê biryardanê li ser girêbestên saziyê heye.

2. Serperiştiya beş û şaxên saziyê dike û karên wan parve dike.

**Madeya /16/**

**Deshilatên cîgirê serok:**

Cîgir di dema amadenebûna serok de, bi her sedemekê, yan bi sedema destjikarberdanê, karên serok dike.

**Beşa heştem**

**Dahata Saziyê**

**Madeya /17/**

**Çavkaniyên dahata saziyê:**

- Alîkariya darayî û moralî ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê, yan her aliyekî têkildar ê navxweyî û navdewletî di pêxema ber bi pêşvebirina projeyên saziyê de.
- Dahata bikarhînana darayiyên saziyê, di çalakiyên berhemhêner ên moletpêdayî de.
- Dahata berhemên saziyê di Youtub û TV û reklamên tora medyaya civakî de.
- Aboneya mehane ya endamên saziyê.

**Madeya /18/**

**Tomarên saziyê:**

- Tomara nav û zanyariyên têkildar bi endaman, rêzbenda hemû wan endamên saziyê li xwe digire, ku di refa saziyê de bi awayekî rêkxistinî çalakiya wan heye.
- Tomara biryaran, tevahiya wan biryar û belgenameyên pêbendbûna Desteya Avaker û Desteya Birêveber li xwe digire, ku karên saziyê organîze dikin û birêve dibin.
- Tomara jimêryarî, hemû wan rêzbendên dahat û derket û bermayiya sindoqê li xwe digire, ku bi awayê jimêryariya modern pişt bi wan tê girêdan.

**Hilweşandina saziyê**

**Madeya /19/**

**Hilweşandina saziyê**

**Yekem - Hilweşandina dilxwaz**

Di rewşa hilweşandina dilxwazane ya saziyê de, hilweşandina saziyê li gorî peyrewa navxwe dibe. Bi dengê (50+1) ji endamên Desteya Avaker yan bi dengê (50+1) ji endamên Desteya Birêveber sazî tê hilweşandin.

**Duyem - Hilweşandina nedilxwaz**

Hilweşandina saziyê bi zorê, bi biryara Dadgeha Seretayî dibe. Di rewşeke wiha de, bo milk û darayî ya (veguhastî yan neveguhastî) li gorî madeya (17) beşa (1,2) ji yasaya hejmar (1) a sala 2011yan a parlementoya Kurdistanê, serederî ligel tê kirin.